R: 3

**Şoreşvanek ku bi mêranî jiya, bi nemerdî jî şehîd ket**



R: 5

**Riya koşka «Heliopolis» bo girtîgeha «Tora»**



R: 7

**Efserên ku li ser rêbaza Kurdatiyê pêdagir bûn**



R: 8

**Xwekujî, diyardeyek giştgîr û metirsîdar**




Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

# Agirî

Hejmar: 185
20'ê Hezîrana 2012'an
Buha: 150 Tûmen


**Pîroz be 32'mîn salvegera avabûna Radyo Dengê Kurdistana Îranê**

27'ê Cozerdanê, salroja avakirina Radyo Dengê Kurdistana Îranê ye. 31 sal bi ser avabûna wê re derbas bûn û moma 32 saliya temenê xwe bi hêvî û asoyek geş ber bi mizgîniya serkeftinê teyîsand.
Em serbarê pîrozbahiyên germ, hêviya berdewamî û serketinê bo xebatlkarên neweste wê dixwazin

**Desteya Weşana Agirî**


Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî


# Pirsa Netewên Îranê Li rojeva Jinêvê de



Civata Mafê Mirov a Kurdistana Îran-Jinêvê, hevdem li gel destpêkirina 20'mîn gera civînên Şêwra mafê mirov a NY, konferansek di bin navê mafê mirov û mafê beşdariya gelên Îranê li desthilatê de li 18'ê Hezîranê di Jinêvê de birêve bir.
Beşdarên sereke ên konferansê pêkhatibûn ji birêzan: Karlo Somaroga (parlemantarê Swîsî), Mistefa Hicrî, sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Karên Parkêr, dadwer û seroka rêxistina parêzerên mafê mirov li NY de, Orêta Bandêtînî, nûnera hertimî ya rêxistina Firans Lîbirte li NY, Nasir Bolîdeyî, nûnerê hizba xelkê Belûçistanê, Diyana Elayî, Nûnera civata navnetewî a Buhayiyan li NY li Jinêvê.


Li civîna han de Mistefa Hicrî, peyamek bi zimanê îngilîzî li ser rewşa niha ya Îran, dever û Kurdistanê pêşkêş kir. Herweha birêz Karlo Somaroga, babetek li ser girîngiya beşdariya kêmaniyên etnîkî û ayînî li Swîsê de pêşkêş kir. Navhatî li axaftinên xwe de basa ceribîna federalîzma welatê xwe (swîs) kir.
Li beşek din de her yek ji birêzan: Nasir bolîdeyî, Orêta Bandêtînî û Diyana Elayî li ser pirsa kêmaniyên ayînî, netewî, pirsa îdamê û biyavên cuda yên mafê mirov axivîn.

Encama konferansê dê li daxuyaniyekê de pêşkêş 21'mîn civîna şêwra mafên Mirov a NY bihê kirin

## Siwarçakên azadiyê, şervanên rojê, qehrmanên berxweder û pêşmergên dujminhejên rûpelên jiyana xwe hildidin

R: 9





## Sergotar

## Dadgehiyek sembolîk

**Selîm Zencîrî**

''Îran Tirîbonal''navê dadgehek sembolîk e ku nawenda mafê mirov a rêxistina Lêborîna NY li Londonê lidar xistiye. Dadgeha han ku li rojên 18 heya 22'ê Hezîranê bi beşdariya hejmarek ji mafnas, çalakên siyasî û sivîl ji Îran û derveyî Îranê birêve diçe, dê Komara Îslamî a Îranê ji ber îdam û tawanên li du dehsalên derbasbûyî de dadgehî bike. Li rastî de dixwaze rola dadgeha Bîrtirand Ratsêl, nivîskar û bîrmendê Îngilîsî li şerê Viyetnamê de bilîze ku karî bala raya giştî a cîhanê rakişîne ser cînayetên Amerîka û têde jî biserket.

Herweha jiber wê ku li sîstema niha ya Îranê de derfeta lidarxistina dadgehek dadperwerane û bêalî bona pêregihîştin bi îdamên bikom yên du dehsalên borî tune, ''Îran Tirîbonal''dixwaze bibe bi tirîbûnek li dijî rejîma Komara Îslamîî û eşkere kirina cînayetên wê.

Ew dadgeha sembolîk li demekê de birêve diçe ku îmkana dadgehek yasayî û qezayî li dijî rejîmê li rojevê de nine. Ji ber ku dadgeha Laheyê tenê dikare pêregihîştina bi ser wan cînayetan re bike ku piştî avabûna wê (2002'an) qewimî bin. Xincî wê jî Komara Îslamî li dadgeha navnetewî a Keyferî de endam nine û egera kişandina wê, (cuda ji daxwaza Konseya Ewlekar a NY) bo dadgeha han nemumkin e.

Ev dadgehe li halekê de birêve diçe ku şemendefira serkut, îdam, işkence, girtin û ... li dirêjahiya temenê rejîmê li dijî xelkê Îranê û bi taybetî netewên bindest ji hereketê nesekiniye û take reaksiyon û dijkiryara navnetewî jî li hember de, şermezarkirina wan cinayetan bûye. Lewma birêveçûna dadgehek sembolîk li Londonê serbarê wê ku bala raya giştî bikişîne ser cinayetên rejîmê û pirsa mafê mirov li vî welatî de, herweha dikare zemîneyek be bo pêşeroja piştî rejîmê.

Hejmar 185, 20'ê Hezîrana 2012

# PDK Îranê di daxuyaniyekê de piştewanî ji gaziya "Şirîn Îbadî" kir

Piştî belavbûna gaziya "Şirîn Îbadî" di pêwendî li gel rizgarkirina canê girtiyên siyasî ên di rewşa nebaş a cesteyî di girtîgehên rejîma Îranê de, PDK Îranê piştevaniya xwe ji wê gaziyê nîşan da.

**Deqa daxuyaniya piştevaniyê bi vî awayî ye:**
Şirîn Îbadî çalaka warê mafên mirovan û serkeftiya xelatê "Aştî a Nobelê", di gaziyekê de tevî mehkûmkirina canjidestdana biguman û îşkenceya girtiyên siyasî di girtîgehên rejîma Îranê de û gefên li ser jiyana wan, daxwaz kiriye ku "Nergiz Mihemedî", Mihemedsidîq Kebûdvend" û "Husên Rewneqî Melekî", sê girtiyên girtîgehên rejîma Îranê ku tûşî nesaxiyên metirsîdar bûne û canê wan di xeterê de ye, bi bê şert û merc bihên serbestberdan.

Paertiya Demokrat a Kurdistana Îranê, weke alîgirê hertimî yê mafên mirovan, piştevaniya xwe ji gaziya "Şirîn Îbadî" radigehîne û bi hurmet ve dinêre hewlên her aliyekê pêdagir li ser mafên mirovan di wê pêwendiyê de.



**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**7'ê Hezîrana 2012'an a Zayînî**
**18'ê Cuzerdana 1391'an a Rojî**

## Sekreterê Giştî ê PDKÎ beşdarî di merasîma koça dawiya dayka Dr. Berhem Salih de kir

**Heyetek PDKÎ beşdarî di rê û resma pirse û sersaxiya koça dawî a "Ronak Reûf" dayîka Dr. Berhem Salih li bajarê Silêmaniyê de kir.**

Roja 14'ê Hezîrana 2012'an, Şandek PDK Îranê bi serperestiya birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di rê û resma pirse û sersaxiya "Ronak Reûf" de kir. Ew dayîka serokwezîrê berê ê Herêma Kurdistanê, birêz Dr. Berhem Ehmed Salih bû.

Şanda partiyê serxweşî û hevxemiya partiyê gihand Dr. Berhem û malabata wî kir û hêvî xwast ku cihê xwedêjêrazî bi biheşta berîn şad be.

Hêjayî gotinê ye ku merasîma sersaxiyê li mizgefta "Ehmed Hacî Elî" li bajarê Silêmaniyê de birêve çû.



**Parlemêntoya Ewrûpayê di biryarnameyekê de**

## Ferq û ciyawazîdananên mesebî û netewî di Îranê de Mahkûm kir



**Parlemêntoya Ewrûpayê bi derkirina biryarnameyekê, daxwaz ji Rejîma Îranê kir ku pabned be bi soz û peymanên navnetewî û bi kêmaniyên mesebî û netewî re reftarek dadperwerane hebe.**
**Biryarnameya han bas ji mafên netewên blindest li Îranê de kiriye û binpêkirina eşkere ya mafên wan ji aliyê rejîmê ve mehkûm kir.**
Di biryarnamê de hatiye ku gelên nefars û pêrewên ol, meseb û baweriyên din di Îranê de li gel arîşe û givaşên cur bi cur berbirû ne. û li vê derheqê de îşare bi sepandina hukmên hebs û îdamê bi ser netewe, meseb û hizrên din di Îranê de. Di biryarnamê de daxwaz ji rejîma Tehranê hatiye kirin ku hukmê îdam kirina 6 hevwelatiyên Erebên Îranî hilweşîne û bi awayek dadperwerane di dadgehan de riftarê digel wan û girtiyên din bihê kirin.
Herweha di birgeyek din ya biryarnamê de hatiye ku Îran çalakên neyarên xwe destbieser, îşkence û paşan jî bi navê qaçaxçiyên madeyên hişber yan ji bi tometa muharibê îdam dike.

## Rejîma Sûriyê cînayetên şer û dijî mirovahiyê encamp dane

**Rêxistina Lêborîna Navnetewî di rapora xwe ya herî nû de bas ji binpêkirina berfireh a mafê mirov, cînayetên şer û cînayet li dijî mirovahiyê ji aliyên hêzên rejîma Sûrî dike.**
Di ve raporê de hatiye ku berfirehbûna tundûrîjiyan di Sûriyê de gihîştiye astê tirajidîk û karesatek mirovî.
Şandiyê rêxiztina lêborîna Navnetewî bo Sûriyê, Donatella Rovera ragehand ku bo her deverek Sûriyê diçûm, xelkê ji min dipirsî çima civaka cîhanî tenê li dûr ve mêze dike û tu karekê bo me nake.
Rêxistina han cinayetên han xiste stûyê hêzên nîzamî û şêwenizamiyên girêdayî dewleta Sûriyê.
**Karê çavdêrên navnetewî li Suriyê sekinî**
Berdewamiya cinayetên han di rewşekê de ye ku Serokê tîma çavdêrên Navnetewî li Sûriyê ragehand ku ew karê xwe disekinînin.
Geniral Rabert Mud, fermandeyê Hêzên Navnetwî li Sûriyê li dor gelaleya Kûfî Enan eşkere kir ku bi sedema zêdebûna tund û tîjiyan di Sûriyê de, ker û çalakiyên çavdêrên navnetewî hatiye asteng kirin, lewma heya midehek nediyar em karê xwe disekinînin.

# Xwendekareke xelkê Makoyê hat kuştin



**Ciwanek Urmiyê jî di avbenda "Noşan"ê de xeniqî**
**Xwendekareka Kurd li ser cadeya Selmasê ji aliyê du kesan ve hat kuştin.**

Nûçegihaniya "Kurdpa" belav kir ku Xwendekarek Kurd a bajarê Makoyê bi navê "Mehnaz Qendkanlû" keça Mihemd li gundê Mîlana ser bi bajarê Makoyê ku li bajrê Selmasê mijûlî xwendinê bû, li ser cadeya Selmasê ji aliyê du birayan ve hatiye revandin û piştî desdirêjîiya cinsî, pere û zêrên wê jê standine û piştre kuştine.

Termê keça xwendekar du rojan berî niha ji aliyê xelkê ve hatiye dîtin.
Bikujên wê keçê hatine destbiserkirin û radestî dezgehên qezayî hatine kirin.

**Xortekî bajarê Urmiyê di avbenda "Noşan"ê de xendiqî**

Li gor hemen çavkaniyê, hatiye zanîn ku 16'ê Hezîrana 2012'an, ciwanekî Kurd bi navê "Îsmaîl" kurê "Ebdulmenaf" temen 23 salî û xelkê gundê "Balacix"a ser bi bajarê Urmiyê di dema avjeniyê de di avbenda "Noşan"ê de binav bûye û canê xwe ji dest da.

Li gor gotina xelkê wê deverê, nebûna hêmayên haydarkirinê, diyarnekirina cihên kûr û mend, nebûna melewanên şareza û nebûna hêza hewarhatinê dibe seba canjidestdana seyrangerên wê avbendê.

Avbenda "Noşan"ê li 12 kîlometriya başûrê Rojavayê bajarê Urmiyê hilkevtî ye.

www.arsivakurd.org

# Şoreşvanek ku bi mêranî jiya, bi nemerdî jî şehîd ket



Selîm Zencîrî

Simayîl axayê şikak, naskirî bi Simko yek ji wan rêber, lîder, serhildêr, şoreşvan û egîdên navdare kurd e ku li dîroka tevgera rizgarîxwaziya Kurdsitanê de xwedî nirx, rûmet û tekoşînek netewî a hêja ye. Wî li qonaxek dîrokî û li deverek stratejîk a Kurdistanê de serhildanek lidarxist ku di warê dem û cih (zemanî û mekanî) de kêmwêne û xwedî taybetmendiyên girîng û berbiçav e. Eger em perwerdeya malbatî, eşîrî a bixwîn a Simko û herweha pêkhateya civakî û sunetî a wê demê raxînin berçavan ku di bin nîrê zordariyê û li nav sîstema derebegatî û eşîrî de hatibû peçavtin, bêguman civandin û komkirina wan axa û eşîretan li bin sîvanek yekgirtî û netewî de, karekî gelek dijwar û li heman dem



îradeyek qahîm dixwast. **B**i baldan bi realîteya civakî a wê demê derdikewe ku bêy rêberiyek lêzan û bîrtîj, dûrbîn, biheybet û şoreşvan ne mumkin bû ku li dilê civakek wusa de serhildanek weha mezin û dîrokî, bitesîr û pirdestkevt derkeve holê. Lê li rastî de rewşenbîrî û kesatiya bilind a Simko karî bi ser vê astenga mezin de biser bikewe û vê girêhişka civakî veke.

Helbet pêşîneya xebat, berxwedanî û comerdiya malbata Simko û li hember de jî nemerdî û bêexlaqiya desthilatdarên Îranê, hişyarî û bîrtîjiya Simko bilindtir kiribû û hestek têde afirandbû ku erkek dîrokî, netewî û exlaqî li ser mil e û divê zend û baskan jêre hilde. Her eva jî bû palnerek bona afirandin û lidarxistina serhildanek weha mezin û netewî. Belge û çavkaniyên dîrokî ku ji zarê Simko ve hatine belav kirinê, nîşan didin ku çiqas birûmet, siyasetwan, neteweperest û li heman dem de jî cîhanbîniyek kûr hebûye.

Nameya wî bo Zefer Eldolê li dor mafên netewî, eyankerê vê rastiyê ye; mafek ku bi dîtina wî, çawa dibe bo hin netewan ku çar yeka kurdan in, rewa ye, lê ji bo kurdan nerewa. Û ger wek kurd wî mafî bidest nexin, mirin û nemana wan baştire ji jîn û mayîna wan, lewma dide zanîn ku desthilatdarên Îranî çi pê xweş bin û çi jî pê nexweş, dê mafê xwe bistînin û bona wê jî, domandina xebatê bi baştirîn rê dizane.

Simkoyê Şikak him li asta navxweyî û him jî li asta derekî de hewla biserxistina serhildana xwe dida. Li hundir de bi bizvandina hesta netewî a kurdan karî vê hesta mirî, bi xebata xwe ya rewşenbîrî û çandî weke avakirina yekem qutabxaneya kurdî, weşandina rojname û kovaran, danîna çapxaneyê, çêkirina belgeyê gomrikê û htd zîndî û bipişkivîne û ji vê riyê ve jî sînorê desthilata xwe berfirehtir bike. Her eva jî bû sedem ku gelek dîrokzan û bîrmendên kurd û biyanî, wî bi bavê nasyonalîzma kurd li Rojhilatê Kurdistanê de dinasin.

Li asta derekî de jî, xebata dîplomatîk û siyasî awî berdewam bî, daku bikare piştewanî û alîkariya wan bo aliyê bizava rizgarîxwaziya kurd li vê parçeyî de rabikişîne; Vêca çi bi rêber û kesatiyên kurd li parçeyên din ên Kurdistanê, bi taybetî başûr, çi jî bi balyoz û siyasetvanên welatên biyanî û zilhêz re.

Simko li wan dudehsalên serhildan û desthilatdariya xwe de rastî gelek pîlan, şerên giran û xiyanetan hat, lê biçokde nehat. Nemaze



Simko bi çend axayên eşîreta Ertûşî re ku hevkarên wî bûn.

gelek caran hêzên pirçek ên desthilata Îranê jî şikest dan. Simko bibû bi astengek mezin li hemberî zêdexwaziya desthilata nawendî a Îranê û xew ji çavên wan herimandibû, her eva jî bû sedem ku Riza xan bona hevdîtina bi Simko re biçe kela Çariyê. Derfetek ku Simko ji dest da û bi kuştina wî, dikarî pêvajoya dîrokê biguherîne.

Simko nexwast nemerdiyê bike û exlaq û mêvanperweriya kurdan bibe jêr pirsiyarê, lê sed heyf û mixabin, kumpilo û siyaseta ku heya niha ji aliyê dujmin ve li hemberî serok û rêberên kurdan de hatiye bikar anîn û bi riya xiyanet û xapandinê ve nizîkî wan bûne, Simko jî vegirt û ket vê davkê. Wan di bin navê hevdîtinê de Simko gazî Şinoyê kirin û êwariya roja 31'ê Cozerdana sala 1309 a rojî, ew bi bêbextî, nemerdî û bêexlaqî şehîd xistin û dawî bi serhildana dîrokî a wî anîn. Lê Simko nemire, jiber ku bi mêranî jiya û bi nemerdî jî hat Şehîd ket.

Di 82 saliya şehîdketina Simkoyê Şikak de silavan dişînim bo ruha pake wî û bejna xwe li hember meznahiya wî û hemû şehîdên riya rizgariya kurdistanê ditewînim.

**Rejîmê bêguhdan bi xwasta rêxistinên navnetewî,**

## Sê girtiyên Ereb ên Ehwazê îdamkirin

**Hêzên Ewlekariya rejîma komara îslamî, sibêdeya roja sêşemî sê ji girtiyên ereb ên Ehwazê serbarê nerazîbûn û daxwaza rêxistinên navnetewî îdam kirin.**

Ebas, Teha û Ebdulrehman, sê xort in ku sala derbasbûyî bi tometa Muharibe û kuştina meimûrek ewlehiya Komara Îslamî hatibûn girtin. Eva di demekê de ye ku di çend rojên derbasbûyî de Parlementoya YE û gelek sazî û rêxistinên mafên mirov weke Lêborîna Navnetewî û Çavdêrên Mafên mirov, seba îdamkirina wan girtiyan haydarî dabûn û eşkere kirin ku di bin îşkence û givaşek zaf de Îfade ji wan girtiyan hatiye wergirtin.

Hêjayê gotinê ye ku ji blî wan sê kesên ku hatine îdamkirin, Elî Neamî û Emîr Meawî jî, her bi vê tometê çavnihêriya birêveçûna hukmê îdamê dikin.

## Panêta:“Divê riya siyasî jî bo pirsa Kurdî hebe“

Li demeke ku pirsa Kurdî di rojeva Tirkiyê de gihiştiye asteke germ, Emerîka jî peyama çareserkirina pirsa Kurdî da Tirkiyê.

Wezîrê Parastina Emerîka Leon Panetta di civîna Konseya Emerîka-Tirkiyê de da diyarkirin ku ji bo çareserkirina pirsa Kurdî li Tirkiyê tenê riya leşkerî nebese, divê riya siyasî jî hebe. Panetta got ku ew ê 'piştgiriya xwe ji bo Tirkiyê di tekoşîna li dijî PKK'ê de berdewam bikin, lê got jî 'çend hêza çekdar girîng be jî, vê pirsê li demeke dirêj de çareser nake. Divê çareseriya siyasî tevlî vê pêvajoyê bê kirin.'

**Zana: "Erdogan dê vê pirsê çareser bike"**

Parlementera bajarê Diyarbekirê Leyla Zana di hevpeyvîna bi rojnameya Huriyetê re da diyarkirin ku ew bawer e Erdogan dê pirsa Kurdî çareser bike. Di vê çarçoveyê de min tu carî bawerî û hêviya xwe wenda nekiriye û wenda jî nakim û ew îrade pê re tê dîtin ku mafên gelê Kurd bide." Her weha bal kişande ser pirsa kurd û got: "Divê ewil gotina terorê û Kurdan bi hev re neyê bikarînan. Divê nasnameya Kurd di destûra bingehîn de bê mîsoger kirin. Divê mafê perwerdeyê bê dayîn. Divê BDP'ê jî piştgiriya pêvajoya destûra nû û hemû kar û xebatên li Tirkiyê dibin û mifaya Kurdan jê heye, bike.

Gotinên Zana reaksiona Demirtaş, KCK û Ehmed Turk lidû xwe re anî û wan da diyarkirin ku eva safîtî ye û AKP'yî hizrîne. Piştî wê Erdoxan da diyarkirinku ger Zana bixwaze em dikarin bi hev re rûnin.



# Rolê ragehandinên hikûmetên dîktator

Rûken

Piştî vê ku Yekîtiya Ereb biryar da ku pêşiya weşana kanalên esmanî ên Sûriyê li mahwareya Nîlsat û Erebsatê de bigre, hikûmeta Îranê bi alîkariya hikûmeta Sûriyê dixwaze ji vê kirîzê rizgar be, û li gorî zanyariyan hijmarek ji karnasên xwe yên teknîkî bi armanca alîkariya bi ragehandinên hikûmeta Sûriyê şandine Sûriyê.

Ragehandinên Sûriyê ew biryara Yekîtiya Ereb li çarçoveya "terorîzma ragehandinî" de bi nav kirin, û daxuyandin ku hinek welatên Erebî ên Kendavê bi piştgiriya rojavayiyan, siyasetek weha girtine pêş da ku rastiya bûyerên ku li Sûriyê de rû didin, berevajî nîşan bidin.

Daxwaza rakirina kanalên hikûmetî ên rejîma Beşar Esed li ser wan mahwareyên navbirî di demekê de ye ku kanala nûçeyî a Elalem ya rejîma Îranê jî heyamekê berî niha bi sedema bilavkirina nûçeyên ne durust û pirr ji vir û direv û hewildan bo pêkanîna neewlehî û tevdanîkariyan li herêmê de ji Nîlsat û Erebsatê hatin avêtin, ku di encam de ew biryar bû sedema kêfxweşiya alîgirên azadî û demokrasiyê û li hemen demê de bû sedema nîgeraniya rejîma Îranê û alîgirên wan.

Di rastî de daxwaza Yekîtiya Ereb ji bo rakirina kanalên ser bi rejîma Sûriyê ên li ser Erebsat û Nîlsatê, daxwazek yasayî, exlaqî û însanî ye li rastaya pêşîgirtina ji wan hemû propagendeyên nerast yên hikûmetekê ku dixwaze li ragehandinên xwe yên giştî de, dîmenek tewaw berevaj ji welatê Sûriyê nîşanî raya giştî bide. Wate dîmenek ku têde ne xelkê nerazî, belku terorîst û cudaxwaz û kirêgirtiyên bîhaniyan çek û teqemenî ji erbabên xwe wergirtine, û êrîşî ser hêzên parêzerê aştî û ewlehiya Sûriyê kirine, û ew jî neçar bûne ku ji bo parastina ewlehiya welatê xwe şerê wan bikin.

Ew kanalên ragehandinê ên hikûmetî serbarê vê ku xwediyê îmkanat û bûdceyek bê qas ji bo pêkana armancên diyarîkirî ne, lê di serdemê pêşkevtina teknolojiya ragehandinê û azadiya çapemeniyan de, wê li hemberî hêz û îradeya xelkê nerazî de bikevne qedeman û wê di gel şikestê berbirû bin. Ji ber ku ew kanal, bi propagendeyên dûr ji rastiyê, hem berdengên (muxatebên) xwe ji dest didin, û hem jî wan berdengan kunckol dikin ku ji bo eşkerekirina vir û direvên wan kanalan, li pey gellek çavkaniyên bê alî bigerin û êdî qet baweriyê bi wan ragehandinên xapîner nekin.

Herçend ew hikûmetên piştevan û tûjkerê hikûmeta Sûriyê bi taybetî rejîma Îranê bixwaze ku li ragehandinên xwe de dîmenek weha aram û êmin ji Sûriyê nîşanî muxateban, lê dîsan jî di nav wan hemû çavkaniyên ragehandinê de ku şev û rojan dîmenên hovîtiyên hêzên Beşar Esed bilav dikin, hewlên wan wê di dirêjheyam de bê encam bimînin.

Jiber ku êdî serdemê girêdana çavên muxateban li hemberî rastiyan, û bilavnekirina dîmenên rastîn û şirove nekirina karnasane û mentiqiyane ya bûyerên rojê, hewlên dawiyê ên wan hikumetên tepeserkar in ku dizanin ew siyasetên wan ên şaş bi hawara wan de nahê, herweha ragehandin niha gihîştiye astekê ku dîktatoran tirsa herî zêde lê hene û wek dujminê yekemîn ê xwe lê dinêrin, lewra tewaya hewla xwe bi kar tînin da ku xelkê serhildêr ji wan çavkaniyan bêpar bikin, ji ber ku di vê serdemê de eva ragehandin e ku şoreşekê pêk tîne û digehîne encamê jî.

# Niqurçk

## Parlemantar bên? Ger serê wan ji şerman bilind dibe bila bên



Ceifer Mubeşirniya

Çend rojan berî niha Parlemantarên Îranê mîna pezê danegermê serê xwe danîn ber xwe û çûn serdana Xamneyî, wî jî serge lê girt û Parlemantaran jî hewêz girt.

Lê xwezî her ewqas ba!! Xamneyî bi başî di guhê wan de xwend û sê tişt gotin:
1: Parlemanterên gerên berê jî hatine hişyarkirin ku bi navê xweseriya Parlemanê, ji dewletê nerazî nebin.
2: divêt Parlemantar di civînên Parlemanê de beşdar bin!!!!!
3: Hin Parlemantar hene gelik hela hela yê dikin û ew yek jî ji wan nahê qebûlkirin.

Vêca tu were vê Parlemanê!!
Belkî Xamneyî bizane jî ka çi garanek xistiye gomexela Parlemanê, lewma dibêje gerek di civînên Parlemanê de amade bin û nekin bore bor jî. Dê başe ger Parlemantar di civînên parlemanê de beşdar nebe, li gel golikek gurrî ku ji garanê pare dimîne û nagîje gomexelê, çi cudahiyek heye!?

Parlemantar ger rexne ji hikûmetê negrin û nerazîtiyên xwe nîşan nedin, çawa nûnerê xelkê ye û dê axaftina xelkê bigîjîne cihê mebest! Lê raste "biraderê ezîzî" raste, Xamneyî dizane ku ew nûnerên xelkê ninin, belkî garanek e wî daye pêşiya xwe, çawa dajo wê bajo, vêca ji wan re girîng ev e zikê wan têr be, bera wan li çi aqar, çi deşt û berojekê ye, ne girîng e. Ez piştrast im ku yek ji wan jî dengê nake û wê bi kêfa Xamneyî bimeşin, çimku Xamneyî bi rohnî got wan ku ger simên xwe xwar danên, wê simên wan bide destê nalbendan ku ji binî ve jêkin.

Vêca parlemantar, ka werin bal min û ez di beriyê de du tifan bikim nav çavên we bo şerefa we, paşê jî bêjim: Başe hûn şermê nakin, namirin, weke "Silêmanî" dibêjin hûn "danarizên".
Ma ewe Parlemantariye hûn dikin? "Xo ger me pez nedîtibe hewêzê, me kişpil dîtine rêzê". Wa em Parlemanên dinyayê jî dibînin, em dewletên din jî dibînin, başe hûn reşawê bixwen gel serên mahran, ma pere ewqas şirîne ku hûn abûr û şerefa xwe dikin du qurûş û dixin ber pêyên pîrehêstirê xurufî "Xamneyî".



## Xwînxwarên cemik bên? Ka mirovahî!!, bila ew jî bên

Rejîma Îranê ragihand ku hizrên me û Rûsiyê ji bo pirsa Sûriyê jihev nêzîk in! Çi yu li vê ecêbê!!!!
We çawa zanî ku hizrên we û




Rûsiyê jihev nêzîk in? Yanî we dixwaast cîhanê ji wê "Surprise"a xwe haydar bikin? Hey barîkella, xo her nebe piştî hemû cîhanê we bixwe jî zanî ku hûn û Rûsiye li ser tepeserî, xwînrijandin, direw, riyakarî, dizî, hîzî û bênamûsiyê jihev nêzîk in.

Lê ew qas nemaye bayê azadiyê berikê li ser cinayet û nemiroviya we cinayetkarên cemik di Sûriyê de hilde. Tenê bimînin û mêze bikin!

www.arsivakurd.org

# Riya koşka «Heliopolis» bo girtîgeha «Tora»


Ebdula Hicab

Serokkomarê Misrê Husnî Mubarek ku heya buhara sala 2011'an bi asûdeyî li koşka Heliopolis ya dîrokiye Qahirê de dijiya û pilana berguhêzkirina deselatê ji bo kurê xwe dikir, di dawiya jiyana xwe de kete quncikê girtîgehê. Deselatdarê ku 30 salan bi dilê xwe, bi piştgiriya artêşê, bêy ku guh bide raya giştî an ji wê bifikire ka xelkê Misrê çawan dijîn û çi difikirin, bi darbestê ji nexweşxaneyê re birin dadgehê û li wir wî bi bêdengî guh da biryara li ser qedera xwe. Biryarek ku koşka xeyalên wî hilweşand û xala dawî danî pêşiya şêweya deselatdariya takekesî li welatê Misrê.

Roja şemî, 02.06.2012 Dadgeha Qahirê bi biryara xwe ya dîrokî berê serokkomarê pêşîne Welat Husnî Mubarek da girtîgeha «Tora». Li gor biryara dadgehê Mubarek ji ber ku di dema deselatdariyê de çarçoveya deselata serokkomar bi xirabî bikar aniye, gendelî kiriye û di dawiyê de jî bûye hegerê kuştina mirovan dibe heya dawiya jiyana xwe di quncê girtîgehê de razê. Bi serokkomarê pêşîn re wezîrê karê hundir, Hebîb El-Adilî jî bi girtina hetahetayê hate ceza kirin. Lê karbidestên payebilinde dine serdema deseltdariya Mubarek, bi her du kurên wî Cemal û Ela re, bê tawan hatin dîtin û bi biryara dadgehê hatine berdan.

Cezaya Mubarek li gor tawanên wî be an ne, giran be an sivik, dadperwerane be an alîgirane û li derveyî çarçoveya dadê mijarek zagoniye û di çarçoveya mafê Tak de dikare were şirove kirin. Lê biryara dadgehê di varê siyasî de biryarek dîrokî bû û nîşan da ku deselatdarî dikare û pêwîste were bi sînûr kirin û deselatdar pêwîste di hember kiryar û biryarên xwe de berpirsyar bin û bersivê bidin.

Biryara dadgeha Qahirê di wê çarçoveyê de sîgnalek mezin bû ji deselatdarên nûye welat û dîktatorên Rojhilata Navîn re ku dibe rojekê, heta di çarçoveya sîstemên nedemokraîk de jî, dewr were guhertin. Bi awayekê ku heta di çarçoveya sîstemên îro de jî deselatdar dikarin bêne neçar kirin ku hem di dema deselatê de û hem jî piştî deselatdariyê li hember kiryarên xwe û şêweya deselatdariyê berpirsiyar bin û berivê bidin.

Misir di nava welatên Erebî de xwediyê stastuyek cuda û ya taybete. Her çend welat kultûra demokrasiyê nîne û sîstema siyasiye welat ji sîstemên antîdemokratîke dine herêma Rojhilata Navîn ne zêde cuda ye, lê olîgarşiya artêşiye deselatdar ji ber rewşa ewlekariya welat pitir xwe girêdayî û muhtacî xelkê didît heya arîstokrasiya ku li welatên dine Erebî deselatdare. Ew şêweya deselatê hinekê rê dida ku carna çarçoveya olîgarşiya deselatdar vebe û hin xwîna nû bikeve demarên deselatdaran. Ne dûr e ku ev rewş bibe heger ku artêş heta dawî bê qeyd û merc girêdayî serokkomar nebe. Lewma jî dema Husnî Mubarek, ku hem raburdûyek leşkerî heye û hem jî bi piştgiriya artêşê hatibû ser kar, li hember xwepîşanderên guhertinxwaz sekinî, artêşê pişta xwe da wî. Dema artêşê pişta xwe dayê êdî Mubarek jî neçar ma ku stuyê xwe li hember xwepîşanderan xwar bike û ji koşka serokkomariyê derkeve.

Bûyera guherîna deselatê, bêy ku sîstema siyasiye welat bê guhertin, Misir xiste rojeva cîhana Erebî û ev hêvî xurt kir ku şoreşa welatên Erebî wê bê xwînrijandina zêde ber bi guhertinên bingehîn li Rojhilata Navîn ve here. Guherîna deselatê her wisan hêz da serhildanên li hember dîktatoriyê û baweriyek wisan çê kir ku wê pêla demokrasiyê berê xwe bide welatên Erebî. Beriya Misrê, guhertina deselatê li Tûnis û piştre jî li Yemen dikarîn bibin mînakek baş ji guhertinên siyasî re ku di wan de alozî û tundu tîjî heye qederekê hate sînûrdar kirin. Lê rewşa Lîbiya û niha jî bûyerên Sûriyê li hember wê pêvajoyê bûne asteng.

Tu guman nîne ya bû heger ku tundûtîjiya li Misrê bê sînûrdar kirin helwêsta artêşê bû ku her li rojên destpêka serhildanan ve sîgnal da wê di aloziya welat de xwe bêalî biparêze. Ev helwêst weke piştberdana Mubarek hate temaşe kirin û rewş li ser qazanca serhildanan guherand. Ji ber ku artêşa Misrê ji dema serxwebûna welat ve heya niha her dem xwediyê gotina sereke di biryarên siyasiye welat de bûye.

Dîroka deselatdariya artêşiye Misrê diçe ser sala 1952 dema ku artêşê Melik Farûq neçar kir dest ji paşatiyê berde û serokatiya welat bide destê kurê xwe yê genc, Fouadê Duyemîn. Lê deselata Fouad pir nedomand û havîna sala 1953 general Muhemde Neqîb deselata paşatiyê bi dawî anî û Komara Misrê damezirand. Generalê damezirênerê Komarê jî pir li ser text nema û sala pişt re (1954) neçar ma ciyê xwe bide general Ebdul Nasir ku mîmarê serekeye serhildana sala 1952 li dijî rêjîma paşatiyê li Misrê bû. Nasir bi alîkariya artêşê heya dema mirina xwe li sala 1970 bi gelek bûyer û astengiyan re rûbirû bû. Şerê 1956 li ser kanala Suêz bi Îsraîl, Birîtaniya Mezin û Feranse re, damezirandinda Komara Yekgirtiye Erebî bi Sûriye û Yemenê re ku sala 1958 heya 1961 jiya, şerê 6 roje bi Îsraîlê re li sala 1967 û bi wan bûyeran re jî pêşvebirina rêbaza nasyonalîzma Erebî rêz û hurmeta Nasir û bi giştî artêşa Misrê di nava civakê de bilind kir.

Lê di rastiyê de şerê bi Îsraîlê re zêde bawerî da xelkê Misrê ku rola artêşê di birêvebirina welat de çi qas giringe. Di gel ku artêşa Misrê li hember artêşa bi hejmar ji xwe biçûktire Îsraîlê di hemû şeran de her şikest dixwar, lê xelkê Misrê pişta artêşê bernedan.

Piştî mirina Nasir li sala 1970 dubare artêş xwediyê biryara sereke li Misrê bû. Her artêş bû ku generalek nû, general Enwer Sadat kire cîgirê Nasir. Dema sala 1981 Enwer Sadat ji aliyê mîlîtanek tundreve îslamî ve hate kuştin, dubare artêşê generlak din, wê carê Husnî Mubarek anî ser kar.

Mubarek li ser riya Sadat berdewam bû, lê xwe ji şer bi Îsraîlê re parast. Wî ji şer bi der, rêbaza aştî û lihevhatinê girte pêş û asta pêwendiyên navbera Misr û Îsraîlê gîhande pêwendiyên asaiye dîplomatîk. Ew siyaset bû heger ku Amerîka bi çavek erênî temaşey Mubarek û deselata artêşa Misrê bike û beşek giring ji mesref û çûnederên artêşa Misrê bide ser milê xwe.

Ew pêwendiyên germ heya dema ku Mubarek ji kar hate avêtina (11.02.2011) her berdewam bûn.

Di gel ku Mubarek u artêşa Misrê metirsiya şer li ser Misrê rakirin, ewlekarî anîn welat û aramiyek di civaka Misrê de ava kirin, xelkê Misrê hêdî hêdî baweriya xwe bi sîstemê û deselatdaran ji dest dan. Nebûna demokrasî, gendeliya siyasî u birêveberiyê, belengazî û desttengiya bê sînûr di civakê de ji aliyekê ve û hewlên Mubarek ji bo xurt kirina bingeha deselata xwe bi riya kurê xwe re nerizayetiya civakê li hember desleatê gîhand asta teqînê. Serhildanên li Tûnis ji xelkê Misrê re jî bû çavkaniya hêz û hêviyê. Di destpêka sala 2011 de pêla dijberiya bi Mubarek re piraniya Misrê girt û di demek kin de gorepana Tehrîr li Qahîre bû navneda serhildana li hember Mubarek.

Di gel ku deselatê di serî de bi awayek tund bi xwepîşandanan re danustan kir, lê bêmeyliya artêşê ji bo piştgirtina bê sînûr li Mubarek rewş bi qazanca serhildanê guherî. Qurbaniyên serhildana Misrê li gor rewşên weke wê serhildanê di welatên dine herêmê de kêmtir bûn. Serhildan di demek ne zêde dirêj de bû heger ku deselata 50 saleye artêşê xwe bide paş û soza hilbijartina vekirî bide.

Piştî ku Mubarek ji kar hate avêtin, berevajiyê kultûra siyasiye li welatên Erebî û welatên dine Rojhilata Navîn, ev û malbata wî li welatê xwe man, yan renge derfeta reva ji welat neket destê wan. Heger çi be, lê Mubarek û malbata wî neçar man stuyê xwe ji ber biryara dadgehê xwar bikin û weke her bergumanek tawanbariyê yên din derkevin pêşberî dadgehê. Ev bûyer ji bo xelkê Misrê û kultûra siyasiye ku ji niha û pêve xwe digre dikare bibe dersek dîrokî û bandorê li ser şêweya deselatdariyê danê.

Mubarek rojên dawiya jiyana xwe eger di girtîgehê de jî derbas neke, wê ew biryar di dîroka Misrê de şopa xwe danê. Biryara dadgehê nîşan da ku êdî ne take dîktator û ne jî olîgarşiya berteng, heta eger bi piştgiriya artêşê u bi hêza çekdar be jî wê nikarin ji niha û pêve bê minet deselata xwe berdewam bikin. Roja jê pirsînê wê her bê û wê qirka wan re bigre ku bê guhdana daxwaza xelkê deselatdariyê dikin.





# Hewlek rastîn yan taktîkek xapîner

Arîn



Wekî xuya niha rojeva herî germ a Turkiyê, pirsa kurd e û vê li roj û mehên pêşiya me de jî her li rojevê de bimîne. Ji ber ku heya niha aliyê hemberî kurdan, tenê partiya desthilatdar a AKP'ê bû ku bas ji çareseriya pirsa kurd dikir, helbet zêde di çarçoveya soz û durûşmeyan de, nexa ji bilî hin gavên biçûk nebin, tu tiştek wusa berçav li pêvajoya çareseriyê de encam neda.

Ger mirov hinekê realîst bifikire, eva zêde taktîkek bûye bona xapandina kurdan û raya giştî a Turkiyê li dor germkirina bazara hilbijartinan û bihêzkirina pêgeha xwe. Meşandina siyasetek bi vî awayî, karî bo sê dewreyên li dû hev garantiya desthilata AKP'ê bike. Eva jî bûye sedem ku çavê partiyên din jî beredayî nede û hêdî hêdî xwe ji vê nêçîra giranbuha nêzîk bikin.

Lewma niha serê çend rojan in ku partiya herî mezin a Opozîsyonê, anku CHP'ê pirsa kurd xistiye rojeva xwe û Turkiyê. Qey tu dibêjî taze hatibe ser hişê xwe û teze dizane ku pirsek mezin bi navê kurd li wî welatî de heye ku hewce dike bi aştiyane were çareser kirin. Bi her hal CHP'ê gavek avêt ku girîng, dîrokî û li rastî de li bejna wê nedihat û li gor raman, realîte û pêşîneya siyasî a wê jê nediweşiya, lewma mirov hinekê ecêbgirtî û matmayî dike û herweha dixe gumanan ku qey tu bêjî micid be li ser? Yan gelo bona berjewendiyên siyasî, reklam û taktîka hilbijartinê ye yan siyaseta nû ya CHP'ê? Gelo merem xapandin û dubare kirina lîstika Erdoxan e yan na qebûlkirina realîteya heyî?

### Realîteyek ku CHP'jî êdî nikare çavê xwe li hember de biniqîne

Nexşerêya CHP'ê ya çareseriyê ku ji paketek 10 madeyî pêk tê, pêşkêşî parlemento û Serokwezîr hatiye kirin. Herweha hevdîtinek jî li navbera serokê CHP'ê û serokê AKP'ê de pêk hat. Xwediyê paketê daxwaz kir ku her 4 partî li meclîsê de li ser vê pirojeyê bihevre kar bikin. Ji ber ku cihê çareser kirina pirsa kurd Meclîs e, madam ku meclîs îrada gel e, cihê çareseriyê jî divê ew be.

Pirojeya han ji aliyê Partiya desthilatdar û Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP'ê) ve hat pêşwazîkirin, bi taybetî Erdoxan ragihand ku ew amade ne derheq pirsa kurd bi her kesî re rûnên, lê partiya neteweperest a MHP bi xurtî li dijî sekinî û ew yek bi hewildanek badilhewa da zanîn. Lê nabe ew partiyane li benda tiştek nû bin ji MHP'ê, jiberku dengderên wê neteweperset in û li dijî her hewl û gavekê ne li vê çarçoveyê de.

Lê rastiyek din jî heye ku niha AKP nîgeran û ditirse ji MHP'ê. CHP'jî nîgerane ji piştgiriya AKP'ê ku bê xapandin. BDP jî nîgerane ji her duyan ku neke taktîkek siyasî be û bixwazin bi rûbendek din temenê vê pirsê dirêj bikin. Lê raya giştî, xelkê Turkiya li benda dawîanîna bi tund û tûjiyê ne û geşbînin bi çareseriyê.




Lê pirojeya han girîngiyek xasmanî a xwe heye ji bo vedîtina rêçareyek guncaw li dor çareseriyê û vê yekê nîşan dide ku hêdî hêdî helwestek hevpar li navbera siyasetvan, rewşenbîr û hevwelatiyên asayî de li dor vê pirsê çê dibe.

Lewma hewce dike kurd vê pirojê pozetîv û bi xalek guhertinê li siyaseta CHP'ê de bibînin û çi ji destê wan bê û dikewe ser milê wan, li dor handan û piştgirîkirina vê pirojê de xemsarî û qusûriyê nekin.

CHP neçare xwe biguherîne, ji ber ku rewş ne ya 20-30 salên berê ye û bona wê ku li qada rikeberiyê de bimîne û bixwaze desthilatê bi dest bixîne, neçare ku vê rastiya tal jî qebûl bike û hezîneyê jêre terxan bike. Ji hêla din ve jî ew endamê Înter Nasyonala Sosyalîst e û divê pêka norm û pîvanên wê jî rabe.

Li vê navberê de AKP jî neçar dimîne ku piştewaniyê ji pirojê bike, ji ber ku sozên xwe bicih neanîn û partiyên din wekî asteng û hincet bikar dianî û niha ku CHP jî amadeye, edî tu hincetek namîne.

Ji ber ku serdana Erdoxan ya bo Amedê li çend rojên derbasbûyî de nedişibî ya salên berê û bi pêşwaziyek sar re ber bi rû bû. Him jî li navxweyî AKP'ê de kurd jê nerazî ne û hêdî hêdî dengê nerazîbûna wan bilind dibe. Ya paştir jî, CHP' niha rikeberiya wê dike bo alternatîv bûnê.

Herweha li asta navnetewî û bi taybetî ji alî YE'ê ve di bin zext û givaşan de ye. Lewma neçare gavên zêdetir ji CHPê bawêje, eva jî em dîbînin li nav vê nîqaşê de, Erdoxan mizgîniyek bi qewlê xwe dîrokî li dor zimanê kurdî dibe kurdan, ku li sala pêşber de kurdî jî weke dersa bijarte û dilxwaz li dibistanên navîn de were perwerdekirin, bê heger nine.

Pêka sîstema perwerdehiya niha ku bo sê qonaxên 4 salî hatiye parve kirin, Dersa bijarte li sinifa pênecem, anku li qonaxa duyemîn de dibe ku were perwerandin. Diyare eva jî tê wê wateyê ku dewletê hêj bi awayek destûrî û qanûnî îtîrafê bi hebûna gelê kurd û mafên wê nekiriye û ev yek jî welatiyên kurd re nabe maf û destkeftiyeka destûrî û qanûnî.

Ger em vê yekê bi nîsbet daxwazên kurdan û rewşa cîhanê, mafên cîhanşimûlî yên însanan û asta vî mafî li welatên din de binirxînin, bêguman gavek gelek biçûk e û divê kurdî bibe zimanê fermî yê perwerdehiyê li baxçê zarokan heya zanîngehan. Berevaj, weke dersa bijarte û li her hefteyê de çend seet perwerde wekî Demirtaş ragihand: tê wateya wê ku hikûmet 5 salan zarokan asimîle bike û piştî wê, zimanê kurdî weke zimanê biyanî bi dilxwaz û li cihê zimanê îngilîzî bide zarokan; eva nabe perwerdeya bi zimanê zikmakî. Herweha li tu cihek cîhanê de zimanê zikmakî weke dersa bijarte nehatiye û ew yek tenê bo zimanên biyanî tê bikaranîn, lewma wusa dixuye ku carê desthilatdarên turk hêj bi çavê biyaniyan mêzeyî kurdan dikin.

Lê ji hêla siyasî û rewşa dîrokî a Turkiyê li gor 80-90 salên derbasbûyî de, gavek girîng, baş û bihêvî ye. Raste têr nake, lê dîsan jî erê jî hewce ye. Lewma hewce dike pêşwazî jê bê kirin û bibin alîkar ji bo gavên nûtir û bi awayek aştiyane xebata xwe bidomînin daku hikûmetê bînin ser vê baweriyê ku pirsa kurd û zimanê kurdî li ser bingeha wekheviyê bê çareser kirin. Bi taybetî ku niha xebatên amadekirina destûrek nû li rojevê de ye û gavên weha biçûk jî dikarin bibin zemîneyek guncaw bo pêşerojê.

www.arsivakurdi.org

# Ew efserên Kurd ku li ser rêbaza Kurdatiyê pêdagir bûn



Şehab Xalidî

Roja 19'ê Hezîrana 1947'an, çar efserên nîştimanperwer ên Kurd ji aliyê rejîma wê demê ya Îraqê ve bi tawana beşdariya li tevgera mafxwaziya gelê Kurd de hatin bidarvekirin. Ew çar efserên Kurd hesta wan ya kurdatiyê bû sedem ku amade nebin xizmetê bi deshilatekê bikin ku tewaya hewla xwe ji bo tepeserkirina Kurdan bi kar tîne, lewra dest ji berpirsayetiyên xwe hilgirtin û riya xizmeta bi neteweya xwe hilbijartin.

Wan çar Efserên Kurd her piştî veqetiyana ji hêzên deshilata wê demê ya Îraqê heyetek pêk anîn û daxwazên Kurdan li çarçoveya daxwaznameyekê li çend xalan de amade kirin û dane hikûmeta Bexdayê.
Lê piştî wê ku wan çar efserên Kurd zanîn hikûmeta wê demê naxwaze ku pirsa Kurdan çareser bike û tewaya hewla wan ew bû barzaniyan neçar bikin ku çekên xwe danên û dest ji şoreşê hilgirin, rû li rojhilatê Kurdistanê kirin û li wir li gel Barzaniyan xizmetên pirr mezin li gorî şarezayiya xwe bi Komara Kurdistanê kirin ku dîrok ji bo heta heta wan û xizmetên wan ji bîr nake û bi xetên zêrîn xizmetên wan wê tomar bike, ji ber ku wan efserên Kurd di serdemekê de ji erteşa Îraqê cuda bûn û dest ji wan pileyên xwe ên bilind hilgirtin ku di nav erteşa Îraqê de çavnihêriyek weha li efserên payebilind ên Kurd nedihate kirin.
Herweha wê demê dewrana şerê dûyemîn ê cîhanî bû û Birîtanya deshilatdarê rastîn ê Îraqê bû û biryar di destê wan de bûn heya di destê Nûrî Seîd de, û berjewendiya Birîtanyayê li dostatiyê bi Erebên deshilatdar re bû heya Kurdan.

Piştî wê ku Komara Kurdistanê bi gellek sedeman hate hiloşandin û dawî bi temenê pirr berhem ê Komara Kurdistanê hat, mela Mistefa Barzanî û hêzên xwe bi afirandina destan rêsiyeke pirr mezin û piştî çend şerên dijwar bi hêzên Îranê re karîn rêpêvîneke dîrokî bikin û ji çemê Eres derbasî Soviyeta Pêşîn bin. Lê mixabin ew çar Efserên nîştimanperwer di ge Şêx Ehmed Barzanî û gellek hevalên din bi gellek sedeman neçar man ku rû li Îraqê bikin. Lê dewleta nawendî ya Îraqê ew çar efserên Kurd yên nîştimanperwer li 19'ê Hezîrana sala 1947'an de bidarvekirin. Termê Mihemed Qudsî û Mistefa Xoşnaw bo bajarê Silêmaniyê û termê Îzet Ebdulezîz bo Amêdiyê û termê Xeyrulla Ebdulkerîm jî bo Hewlêrê hate birin.

Wê demê xelkê Kurdistana başûr bo rêzgirtina ji xebat û tekoşîna wan efserên Kurd û bona selimandina vê rastiyê ku ew nirxên xwe yên netewî ji bîr nakin û wê rê û rêbaza wan bidomînin, li ber çavê deshilatdarên wê demê meşên berfireh rêve birin û ew kiryara wan şermezar kirin û bi awayê herî baş termê wan ber bi aramgeha wan ya ebedî ve rê kirin.
Wan çar efserên nîştimanperwer bi vê xizmeta ku bi Komara Kurdistanê kirin û bi vê wesiyetnameya xwe ya ku têde şîreta xortên Kurd kiribûn ku berdewam bin li ser xebat û tekoşîna ji bo standina mafê xwe, dan selimandin ku heya çi qasekê bi rê û rêbaza Kurdatiyê emegdar in, û bi şanazî ve mirina li pêxema xizmeta bi nîştimana xwe qebûl dikin.

Lewra ew xizmet û fîdakariya wan ya ji bo neteweya wan û şehîdbûna wan ya li ser Kurdatiyê qet ji bîra xortên Kurd naçe û navê wan bo heta heta li nav rûpelên dîroka Kurdan de wê bimîne.




## Rojev




# Êrîşa leşkirî li dijî Esed, Îranê jî lawaz dike

W: Agirî

Lord Corc Waydin, nivîskarê birîtanî li rojnameya "Die Waltt"a Almanî de babetek li dor rewşa Sûriyê û aliyên têkildar bi wê weşandiye li jêr navnîşanê "Nemana Esed, dawiyê bi nifûza rejîmê li deverê de tîne".

Ew li destpêkê de basa rewşa Sûriyê dike ku kirîzên wê bidawî nabin.
Biryarnameya Konseya Ewlekar li dor êrîşa leşkirî li dijî sûriyê dikare dawiyê bi wê rikeberiyê bîne. Herweha Komara Îslamî jî lawaz bike û bi vî awayî rê ji bo dawîanîna bi kirîzên Rojhilata navîn re vedike.

Ewa ku hikûmeta hov a Esed li Sûriyê de ji desttêwerdana leşkirî a hevalbendiyek mezin pêkhatî ji Komkara Erebî, Nato û hemû cîhana azad parastiye, zêde destê alîkare Rûsiyê û Tehranê nine, belkî nîgeranî ew e ku êrîşa leşkirî û guhertina hikûmetê dibe sedem ku rewşek xirabtir weke şerê navxweyî ê mesebî û cinayetên rêxistinkirî û çalakiyên terorîstî ên Elqaîdeyê bibe.

Ger bi dûr ji îhsasatê mêzeyî rewşê bikin, heftiyên tê û pêşerojê ji bo êrîşa li dijî Esed munasib û guncaw in. Pêgeha Yekêtiya Ereb û hevkariya Nato ku têde Turkiye weke endamê bisilman yê wê, vê carê dikare bi erteşek bihêz rolek mîhwerî bilîze û li dawiyê de jî xurtbûn û bihêzbûna roj li pey rojê zêdetir a opozîsyona Sûriyê li hundur de renge bikare pêşya dîktatorî li Demişqê de bigre.

**Torên terorê dê jinav biçin**

Êrîşek diyarîkirî li dijî hikûmeta Esed dikare encamek din jî ji bo aştiya cîhanî li pey re hebe. Cudakirina hêl û mîhwera Tehran- Demişqê û bi vî awayî jî dawiya hevalbendiya nizîk a Komara Îslamî bî tundajo û radîkalên Hizbulaha Lubnanê û rizgariya dubare a wî welatê êşkişandî.

Li rewşek weha û li egerek wusa de pêwendiyên Komara Îslamî jî bi Hemas, Cehad û gelek gurûpên terorîstî ên din ku fermandehiya wan li Demişqê de ye, dê jinav biçe. Bi kurtî hiloşîna rejîma Esed, dibe sedema dawîhatina bi hizûr û nifûza nemubarek a rejîma Îranê li ser deverê.

Karê han û xurtkirina tehrîmên aborî ne tenê hewcehiya bi êrîşa ser Îranê kêm dike, belkî vê îmkanê dide neyar û muxalîfeta rejîma Îranê ku bi xwasta xwe bi azadî û mafên mirovî bigihîjin.

Bi hebûna alîkariyên bişerm ên Rûsiyê û hewildanên biparêz ên Çînê bona wê ku hikûmeta Esed bi Tund û tûjiyê re nehiloşe, ev du hêzên mezin bi baldan bi kiryarek cîhanî li dijî yek ji hikûmetên herî hov piştî şerê duyemîn ê cîhanî, helwest û reftarên serhişkane ên xwe dê hinekê nermtir bikin.

**Çavkanî: irandarjahan**

www.arshivakurdi.org

# Xwekujî, diyardeyek giştgîr û metirsîdar



Şine Dirûdger

Yek ji diyardeyên berçav ên nav civakê, xwekuştin e ku tîrojkên wê ber hemû civakên cîhanê bi rêjeyek ciyawaz ketine. Xwekuştin pêk tê ji hewildanek serkevtî yan jî sernekevtî bo ji navbirina xwe bi awayek mebestdar. Wate mirinê bi take rêya derbasbûn ji dijwariyên jiyanê dizanin.

Xwekuştin ji peyva(Sui) bi wateya xwe û (Caedere) bi wateya kuştin tê ku bingehek Latînî heye.Xwekuştin diyardeyek nû nine,belkîdi despêka hebûna mirovahiyê de ser hildaye. Lêkolîn li ser xwekujiyê weke diyardeyek civakî, 200 salan berî niha ji aliyê lêkolerên rojavayî ve hatiye encamdan. Jiyana sunnetî û hejariyê di vê serdemê de karek weha kir ku rêjeya xwekujiyê ber bi zêde bûnê ve biçe û di encam de pisporên civakî û derûnnasî neçar man ku vê kolîan bi merema vedîtina vê diyardê bikin.

Di çend dehikên vê dawiyê de diyardeya xwekujiyê bi qasekê zaf bûye ku di hemû temenên ciyawaz weke pîr, ciwan, nûcivan de tê dîtin.Ewe di demekê deye ku lêkolînên zanistî derdixin ku rêjeya xwe kujiyê li seranserî cîhanê jorde çûye. Di yek ji serjimêriyên rêxistina saxlemiya cîhanî (W.H.O) de derdikeve ku di her salekê de rêjeya xwekujiyê digîje 900 hezar kesî. Herweha lêkolînan eşkere kiriye ku di piraniya welatên cîhanê de xwekujî weke yek ji sedemên sereke ên mirina mirovan tê zanîn.

Bo mînak di welatê Birîtanyayê de xwekuştin weke sêyem sedema mirinê piştî nesaxiya dil û Penceşêrê tê hesibandin. Li welatên Îskandinavî di her salekê deji her 100 hezar kesan 40 kes û li Amerîkayê di her salekê de pitir ji 30 hezar kes xwe dikujin, wate di rojê de 85 kes û di her 20 Xulekan de kesek xwe dikuje û herweha bi giştî di wan welatan deher sal de 650 hezar kes hewla xwekuştinê didin. Xûyaye ku rêjeya xwekujiyê di her welatekê û di her qonaxekê de ciyawaze, ew jî vedigere ser guhertinên siyasî, civakî û çandî yên wan welatan. Her eva jî bûye sebeba vê yekê ku Rêxistina Cîhanî ya Saxlemiyê roja 10ê heyva Septamberê, wate roja 19ê Xermananê weke roja cîhaniya pêşgirtin ji xwekujiyê diyarî bike.

Li gor amaran ev diyardeye li Îranê jî her ku diçezêdetir dibe û li vê derhrqê depiştî welatên Kolombiya, Birazîl û Çînê weke pêncemîn welat tê hesibandin.

Belge û dekomênt nîşan didin ku sedema xwekujiyê li Îranê wedigerin boxirabiya rewşa siyas, abûrî, bêkarî û htd.Herweha rêjeya herî zaf ya xwekujiyê di Îranê de li parêzgehên Kirmaşan, Îlam û Hemedanê de ye. Piraniya haletên xwekujiya jinan di Îranê de ji riya xweşevitandin û xarina heban veya û herweha di mêran de jî li rêya bikaranîna çek û xwe daliqandinê ve ye.

Encamdana her karekê sedemyan hayderek xwe heye û encamdana kiryara xwekujiyê jîbê guman hayderên xwe hene ku dikare mirovekê ber bi xwekujiyê bibe.

**Li vir emê bi awayek kurt bas ji hokarên sereke êndiyardeya xwekujiyê bikin.**

1) sedemên derûnî: beşek ji derûnnasan liser vê baweriyê ne ku ew kesên dest didin xwekujiyê,pirsgirêkên derûnî hene. Bo mînak mirov di vê rewşê de hest bi pûçî, bê hîvîtî û kêşeyên sozdariyê dike, herweha alozî û têkçûna rewşa saxlemiya derûnî jî weke yek ji hokar û hayderên herî bi hêz ên xwekujiyê tê hejmar, bo mînak kesên ku tûşî nesaxiyên Xemokî, Sikîzofrîniya, dilkutok, Elkolî(moitadên elkulê) bûne, 3 heya 12 beraberî kesên asayî ber bi xwkujiyê ve diçin.

2) sedemên civakî: bê guman ev hokare rolek serekî li dor serhildana diyardeya xwekujiyê heye, çûnkî mirov rihliberek civakî ye û tewahiya riftarên xwe li encama karîgeriyên bi





derdorê re digire. Lewma hiloşîna malbatî (Telaq) û jinavçûna peywendiyên derûnî di navbera wan de, sedemek ku mirov hest bi biyanîtî û xerîniyê bike û îzole bibe, lewra bo rizgar bûn ji rewşek weha rêya xwekujiyê peyda dike.

3) Sedemên abûrî: Hejarî û destkurtî, bêkarî û.... hokarên sereke ne bo encamdana kiryara xwekujiyê ji aliyê mirovan ve.

Piraniya kesên ku kiryara xwekujiyê encam didin, ew in ku li jiyana hewvpar û piroseya hewseriyê de serneketine, yan zarokên ku li encama telaqê ji dayk yan bavê xwe dûr ketine û... .

Xwekujî ji kesekê bo kesek din diguhere û eva jî bûye sebeb ku bi ser çend ast û qonaxan de bihêt parvekirin.

1) Bîroke û hizra xwekuştinê: hizirîn ji xwekujiyê bi awayek rasterast yan nerasterast û xwe azardanê lê bê derbirîn û eşkerekirina niyetek rast.

2) Gefkirin bi xwekujiyê: di vê cure de mirovê nesax rasterast yan jî nerasterast ji rêya gotin yan nivîsandinê gefa xwekuştinê di xwe, lê di piratîk de tu karekê nake.

3) Riftara xwekujiyê:hin kar û riftaran dike li dor azardana xwe, lê dizane û xatircem e ye ku nabe sebeba mirinê, weke birîna şademarên cesteya xwe bi kêrên pilastîk, xwarina çend hebên zêde ku nabe sebeba mirinê.

4) Hewla xwekujiyê: zirar gihandin bi xwe ku dikare bibe hokara birînên mezin yan jî biçûk bi merema dawîanîn bi jiyana xwe, bo mînak birîndar kirina cesteya xwe.

5) Xwekujiya tewahî: bi tewahî daviyê bi jiyana xwe tîne ji rêya mifahwergirtin li alavên weke bikar anîna çek, xwe şewitandin, derman xwarin yan xwe daliqandin.

**Çawa dikarîn wan kesan nas bikin ku gumana xwekujiyê li ser wan heye?**

Piraniya kiryarên xwekujiyê li nişkî ve nine, belkî beriya hewildan do xwekujiyê çend guhertinek di nav kesê xwekuj de pêk tên ku xwediyê hin peyam û îşareyan e û kesên derdorê dikarin hest pêbikin. Bo mînak:

1) Pêştir hewla xwekujiyê dabe

2) Nesaxiyek derûnî, yan jî rewşek xirab a derûnî hebe weke dilkutok û xemokî.

3) Guhertinan di kiryar û riftaran de. Weke veqetandi û paşdekişiyan ji aliyê civakî û kêmbûna peywendiyan digel çarmedorawî de

4) Xirab bikaranîna derman yan bengdarî bi madeyên hişber û elkolê re

5) Hestkirin bi tinêtî, û bêhêvîtî û nebûna hevkariyê

6) Çêbûna guhertinan di xwarin, nivistin û çalakiyên rojane de

7) Pêkhatina haletê şerxwazî û tûrebûnê

8) Jidestdana kesên nêzîk, serwet û saman û pîşeya xwe di midehê pêş kiryarê de

9) Hebûna haleta xewkujiyê yan hewla xwkujiyê di dîroka malbata wî de

10) Di jiyana xwe de gelek karesat li dû hev bi ser de hatibin.

**Hin peyamên mirovan ku amaje bi xwekujiyê dikin:**

1) Payama rasterasta dewkî: bi awayek rasterast bi derdora xwe re dibêje, xwe dikujim. Hevdem digel nerihetbûn û tawanbarkirina kesên beranber xwe, gefa xwekuştinê dide û dibêje; li kerbaête ye xwe dikujim û hekî vî karî bi min re nekî ezê xwe bikujim.

2) Peyama nerasterasta devikî: Midehek berî hewla xwekujiyê de, hin gotina tîne ziman ku, îşare bi vêzarî û bêhîvîtiyê dikin.Gotinên weke; eve ka jiyane, mirin ji vê jiyanê xweştire,herweha endamên malbat û hevalên xwe re dibêje, eger cardin em hevdû bibînin.

3). Peyama rasterast û ne dewikî: bi awayek kiryarî bi derdora xwe dibêje ku armanca wî xwekujî ye, weke peyda kirina çek, komkirina heban, kirîn û bidestxistina madeyên jehrî, amadekirina petrol yan Benzîn û çûna ser cihên bilind.

4) Peyama nerasterast ya nedevkî: midehek berî xwekujiyê hewl didebo rêzistinatiştên taybetî ên xwe, weke tiştên navmalê, vegerandin û dana deynên xwe, bexşîna keresteyên xwe, pêşdetir kesek goşegîr bûye lê di vê heyamê de seredana piraniya xizm û kes û hevlên xwe dike bi merema xatirxwastina ji wan.

www.arsivakurd.org

Hejmar 185, 20'ê Hezîrana 2012

**Pêşmergên qehreman û cesûr ên PDKÎ ku bi salane di çepera berxwedan û xebat bona bidestxistina mafên netewî di tekoşînek rewa de ne û li vê pêvajoyê de dev ji hemû xweşî û rehetiyên jiyanê berdane. Her yek ji wantûrikek tejî ji bîrewerî, dastanrêsî û hemasetan hilgirtine ku hilgirê nivîsîna dehan pirtûkan e. Vê carê jî emê hewil bidin kuncek biçuk ji bîrewerî û jiyana pêşmergatiya du şoreşvanan raxînin berçawên we.**



Hevpeyvîn: Arif Velezî

Mihemed Nasirî, kurê Ebdulla, sala 1346'ê li gundê Emînava ya ser bi bajarê Tikabê hatiye dinê.

Di zarokiye xwe de karên cur bi cur weke şivanî, berxevanî, gavanî, kedkarî û.... bo malbata xwe û bo xelkê kirine. mema temenê wî gihîştiye 20 saliyê, diçe serbaziyê. Piştî dawîhatina serbaziyê cardin vedigere gundê xwe.

Mihemed Nasirî dibêje: Min PDK Îranê gelek bi başî nas nedikir, çûnkî min xwendewarî nebû, lê şerê Sê mangî dengvedanek weha mezin di Kurdistanê de afirand ku bû sebeb ez PDK Îranê binasim û biryara hilgirtina çeka pêşmergatiyê bidim. Lewre ez tevlî refên pêşmergan li nav PDKÎ de bûm.

Di bersiva pirsyara ku çima heya niha nezewicî ye? Mihemed weha dibêje; her di despêka nûciwaniya xwe de seba desttengî û hejariyê min nekarî bizewicim û herweha min tu xizm û kes jî nebûn ku ez daxwaza hevkariya malî jê bikim. Paşan ku bûme pêşmerge jî, min zêde guh nedaye vê mijarê, lewre heya niha nezewicîme.

Mihemed Nasirî niha kêmendam e û pêyek wî hatiye birrîn. Li dor vê bûyerê de eşkere kir ku: Ez û komek pêşmergan li gundê Qizqepana ser bi bajarê Tikabê, heyamê 5 şev û rojan di nava befrê de ji aliyê caş û çekdarên Komara Îslamî ve hatine dorpêç kirin û me şerê man û nemanê dikir. Li wî şerî de em derbas bûn, lê mixabin piyê 20 pêşmergan sirrêbirî bûn ku yek ji wan, ez bûm. Ew rewş heya sala 1381'an domiya, lê li bûyerek din de li Gir Çadira nêzîk bajarê Koyê (kuristana başûr) fîşekek ji destê hevalek Hizbî de derçû û mixabin bi piyê min ket, piştî mideheké seba xirabiya birîna gulleyê, nojdar neçar man ku piyê min bibirin.

Ew bîreweriya herî xweş a jiyana xwe li dîtina ji nêzîk ve a Dr. Qasimlo vedigerîne û dibêje: Sala ku Komara Îslamî êrîş kire ser bajarê Serdeşt û derdora wê, ez wekî meimûriyet bo Komîteya Serdeştê hatibûm şandin. Rojekê şer gerim bû di navbera hêzên Komara Îslamî û hêza pêşmerge de, Muzefer Teymûrî ku Fermandehiya şer li eniya me de dikir, hat û regehand ku Dr.Qasimlo dê bê û seredana pêşmergan bike. Şehîd Qasimlo heya kûrahiya şer hat û civînek bo me girt. Di civînê de me Dr.Qasimlo rexne kir ku çima derbasî nuqteya kûr a şer bûye û ewqas rê biriye û hatiye cem me, û me daxwaz jê kir ku bilez paşde vegere.

**Ez 5 şev û rojan di nav befrê de ji aliyê caş û pasdaran ve hatim dorpêç kirin**

Wê demê Hêza Piştîvan ya ser bi Yekêtiya Nîştimanî a Kurdistana Îraqê di hemû eniyan de mil bi milê pêşmergên PDK li dijî hêzên Komara Îslamî şer dikir, şehîd Qasimlo daxwaz ji Kak Muzefer kir ku piraniya pêşmergên Hêza Piştîvan li bal xwe rabigre heya dawiya şer. Eva cara yekem bû ku ez Dr.Qasimlo ji nêz ve bibînim ku hestek pir xweş da min û tu car ji bîr nakim.

Derheq nûçeya herî nexweş, bi êş û azar li bal xwe, Mihemedê Şoreşvan da zanîn: Ez li nexweşxaneya partiyê



li Qendîlê de çayçiyê pêşmergan bûm, demjimêr 12'ê nîvro Radyo Dengê Kurdistana Îranê xebera şehîdketina Dr.Qasimlo ragehand, xemgîniyek mezin têkel bi azar û giriyê hemû cismê min dagirt û min ji nerehetiyan de nedizanî ku çi bikim. Ew roj, roja herî nexweş bû di jiyana min de heya niha, birastî min we dizanî ku cergê min birîn.

Mihemed Nasirî di dawiya gotin û biserhatên xwe de ku mixabin tenê derfeta weşandina beşek ji wan me heye, serbarê şandina silavan bo ruha pak a şehîdan, bo malbatên şehîd û girtiyên siyasî û hemû xelkê Kurdistanê re, daxwaza serkevtinê Partiya xwe kir ku hêviyek herî mezin a wî ye û li vê derheqê de rû ji keç û xortên Kurdistanê kir ku bo gelê xwe bixebitin û dûr bin ji her pîlan û kumpiloyekê ku dujmin dixwaze ji riya we ve bi dijî gel birêve bibe.

Tofîq Elmaspûr, naskirî bi Mam Tofîq kurê Seîd, sala 1339an, li gundê Hesen Liwêlan a ser bi bajarê Sayînqelayê ji dayîk bûye. Di zarokiya xwe de karê cotyarî û pezdariyê bi malbata xwe re kiriye heya sala 1357an, ku navê wî ji leşkeriya rejîmê re tê, lê hikûmeta Pehlewî diherife û naçe serbaziyê.

Mam Tofîq li dor naskirina PDK Îranê weha dibêje; Temenê min 17- 18 salî bû, min bindestiya gelê kurd hîs dikir, lê bona wê ku min xwendewarî nebû, min zulm û zora ser gelê xwe jî bi başî nedizanî. Lê nav û deng, qehremanî û cangorîtiya pêşmergan ku bibûne dastan û çîrokên ser zimanê kalan, ez jî ecibandibûm û bibûme evîndarê pêşmergan û vê rêbazê.

Serencam sala 1358'an, komek pêşmergên hizbê derbasî gundê me bûn. Ez bi eşq û evînî ve çûme bal wan û min daxwaz kir ku bibim pêşmerge. Wan ez şandim fêrgeha partiyê. Dûre bo midehê 40 rojan min çay bo pêşmergan tê dikir. Piştî wê çeka partiyê dan min û cardin ez şandim gundê xwe.

Mam Tofîq basa evîndariya xwe



bi Xedîce Feyzî re dike ku niha hevjîna wî ye. Piştî dildarî û hejêkirinek domdirêj ew dizewicin û take kurek dibe berhema jiyana wan.

Gelek kes ji dost, heval û hevçeperên mam Tofîq bas û pesna biwêrî, çelengî û mêrxasî, îrade û morala bihêze wî di qada şer de dikin, ku li rastî de pêşmergeyek qehreman bûye. Ew du caran birîndar bûye. Cara yekem sala 1365an li çiyayê Şek Meydana Sayîqelayê ez birîndar ketim. Cara duyem jî sala 1369an, li Pîr Çopan a ku dikewe navbera bajarên Seqiz û Bokanê de, piyê min bi tundî birîndar bû, ku heya niha jî ez azara wê dikişînim û li rastî de ew piyê min seqet e.

Elmaspûr dema bas ji êş û elemên jiyana pêşmergatiya xwe dikir, ez jî matmayî û kûr difikirîm ku çiqas astengî û kovan dîtine, lê bo careké jî hizir ji xiyanet û destberdan ji rêbaza xwe nekiriye.

Wî dastana êxsîrketin û revîna xwe ji destê hêzên Komara Îslamî re weha vegerand: Sala 1360'î li gundê Quzlû ya Hevşarê, şerê me û hêzên Komara Îslamî çêbû, mixabin ez êxsîr ketim û hukmê 15 sal cezaya zîndanê bi min re hat dayîn, lê piştî 3 sal û nîvan, di meha dawîn a havîna sala 1364'an, min karî ji zîndanê birevim û cardin vegeriyam nav refên partiya xwe û xebat û tekoşînê ji nû ve dest pêbikim.

Bîreweriya xweş ya Tofîq Elmaspûr ew bû ku demsala zivistanê dihat û em li menteqê dizivirîn. Dr.Qasimlo jî dihat civîn pêk dianîn û bo me diaxivî. Dema ku çavên min bi Dr.Qasimlo diketin, ez pirr dilxweş dibûm û heya dawiya civînê ez sermestê dîtin, nêrîn, ken û xweşbêjiya wî dibûm.

Mam Tofîq qala bîreweriyên tal di jiyana siyasî ya xwe de kir. Bi teybetî yek ji wan pirr balkêş bû ku hovêtiya rejîmê nîşan dide. Wî da zanîn dema ku êxsîr ketiye, 7 caş û xwefiroşên devera wan çûne bo bi nav dadgeha rejîmê, daku şahidiyê li ser wî bidin û cezayên wî girantir bikin. Yek ji wan, Ehmed Gulê dibe ku midehek kurt pêşmergê PDKÎ bûye, lê xwe teslîmî Komara Îslamî kiribû. Dema ku di nava partiyê de dibe, mam Tofîq gelek xizmeta wî kiriye. Lewma di dadgehê de jêre dibêje: keko min gelek başî bi nîsbet te kirine, lê çima tu dixwazî li dijî min îfadan bidî û min bidî kuştinê?

Di bersiva min de li ser hemdê xwe got; xwe nerihet neke! te jinek û kurek heye, hekî xwedê bixwaze dema tu hatî îdamkirinê, ezê jina te ji xwe mare bikim û kurê te jî xwedî bikim! Te xem nebe! û hîl hîl dikeniya. Wî ez gelek şikandim. Ez pir aciz bûm û li hêrsan de min nedizazî û ne jî dikarî çi bikim. Lê ew heyf li ser wan nema û piştî çend salan li şerek bi pêşmergan re hatin kuştin.

Piştî xebatek 30 salî, Mam Tofîq mîna salên destpêka xebata xwe, her qurs û qahîm û hêvîdar e bi serketinê û dixwaze bi serbilindî vegere nav gel û doma temenê xwe li ser xaka xwe bijît. Lewma ciwanên kurd re dibêje: haydar bin! bi ked, xebat û qurbaniyên zaf ve me kariye PDK Îranê heya vê qonaxê bînin û li ser xebata xwe ya rewa berdewam ragirin, lê ji niha şûn de ew erka li ser milê we ye û divê hûn jî tevlî xebatê bibin, vêca di her çeperekê de be, girîng armanc, xizmet û rizgarî ye.

**''xwe nerihet neke! te jinek û kurek heye, hekî xwedê bixwaze dema tu hatî îdamkirinê, ezê jina te ji xwe mare bikim û kurê te jî xwedî bikim!''**

Hejmar 185, 20'ê Hezîrana 2012

# Bajarê Pîranşehr



**Kurdên herêmê li dirêjahiya dîrokê û li hemû qonaxên xebata netewî ya gelê Kurd li dijî dagîrkerên Kurdistanê xebat kirine û kesyetiyên wekî Bapîr Axa Mengur, Hemze Axa Mengur û bi sedan kesayetiyên din pêşkêşî tevgera rizgarîxwazî ya Netewa Kurd kirine.**

**Li serdemê serhildana gelên Îranê li sala 1975a zayînî gelê Kurd xwest ku bi mafên xwe yên Mirovî û dîrokî şa be, lê sed heyf û mixabin rejîma Melayan ev yek nepejirandin û her seba vê yekê şerekî malwêranker bi ser Kurdistanê de sepandin. Li encama ew karê rejîma Îranê bi sedan ciwanên welatparêz tevlî serhildana gelê Kurd bi rêberîya PDKÎ bûn û li dijî rejîma Îranê rawestan.**



Mecîd Cinîkanlû

Herêma Pîranşehrê li parêzgeha Urmiyê û li Sînorê başûr û rojhilatê Kurdistanê hilketiye. Navenda vê Şaristanê, bajarê pîranşehrê ye. Navê qedîm yê bajêr, Xanê bûye. Lê bi derbaz bûna zeman navê bajêr seba akincî bûna eşîra Pîran li herêmê bi Pîranşar hat navdêr kirin. Bajarê Pîranşehrê seba hilkevta coxrafiyayî û hilktin li çem çiyayên Qendîl, Hacî Birahîm, Sûre Dal û Çil Bizne, xwediyê av û hewayekî sar û çiyeyî ye. Ev herêm ji 2 Melbendên Navendî û Lacanê pêktê û xwediyê 2 bajarên Pîranşehr û Girdkaşanê ye.

Li herêmê de gelek rûbarên bi av wek: Sêlwê, Lawên, Badînavê, Gede û zê hene kû piraniya wan têkilî rûbarê Zê dibin û paş derbaz bûn li herêma Serdeştê, dirêjine nav bendava Dukan li başûrê Kurdistanê.

Li çiyayên herêmê de gelek heywanên kêwî wek: Hirç, Mambiz, gorg, rêwî û ...hdw hene ku ji aliyê Îdareya Jîngehê tên parastin.

Nifûsa akinciyên herêmê li sala 1388a rojî 30617 malbat bûye ku 107677 nefer akinciyên wê herêmê ne.

Herêm seba çiyayîbûnê gelek daristan hene û ev yek bûye sebebê vê yekê ku xelkekî zaf li seranserî Îranê ji bo Seyran û xweşiyê serdana vê herêmê bikin û ji bo demekê dûr ji hemû kêşe û pirsgirêkên nav civakê li vê herêmê demekî xweş bi ser bibin.

Li girîngtirîn Seyrangehên herêmê em dikarin îşare bi: Pirdanan, Çiyayê Qendîl, Badînavê, Qelatî Şay, Kanî Zerd û Solê Xerpap bikin.

Her wusa li herêmê de 113 şûnwarên dîrokî yên gelek kevnar hene ku eva jî xwe bûye sebebê hatina xelkekî zaf ji bo dîtina wan asewaran. Pêka wan şûnwarên bicih mayî li herêmê de şaristaniyetên wek: Manayî, Parsayî, Ûrator, Med û ...htd akincî bûne.

Kela gundê Şînawê, Kela motawê, Kela Celdîyan, Kela Peswê, Kêla berde Mafûre, Daşan û kevirên gundê Xûrinc li girîngtirîn asewarên dîrokî yên herêmê ne.

Hebûna bazarçeya sinorî a Temer çîyan li navbera welatê Îran û Başûrê Kurdistanê û hinartin û anîna pêdawîstiyên herêmê li rêya vê bazarçê, girîngîyekî zaf daye herêmê û ev bazarça sinorî wek yek ji serekîtirîn bingehên peyda kirina dahatê bo xelikê herêmê tê hejmartin. Hebûna vê bazarçê, bûye sebeb ku xelkekî zaf ji seranserî Îranê serdana wî bajarî bikin û pêdviyên jiyan xwe li wir bidest binin.

Zewiyên baş jibo çandiniyê û hebûna avekî zaf ji bo çandiniyê, bûye sebebê vê yekê ku li herêmê de kiştûkaliyê derfetekî baş hebe.

Piraniya berhemên wek: Genim, Ce, Silk, Nûk, goleberoj û darên wek: Sêv, Xox, Gîz, Qeysî, Tirî û ...hdw li herêmê de berhemekî gelek baş hebin û ev yek jî bûye sebebê avedaniya herêmê. Her seba vê çandinîya baş li herêmê de Karxaneyekî çêkirina Qendê heye ku parek zaf ji pêdiviyên parêzgeha Urmiyê dabîn dikin. Li herêmê de her wisa xelkekî zaf heye ku mijûlê karê heywandariyê ne û ji vê rêyê ve jiyana xwe dabîn dikin. Li piraniya gundên herêmê xelik heywanan xwedî dikin û li bihar û hawînê zozanên bo çiyayên herêmê wek Qendîl û geliyê Hacî Birahîm diçin û li wir dimînin.

Ev yek jî bûye sebeb ku dahatekî baş ji bo xelkê herêmê çêbe
Xelkê herêmê hemû Kurd û bi zarawê Soranî qise dikin û li 3'ê hozên Mameş, Pîran û Seyîd pêk tên.

Ev herêma Kurdistanê gelek caran kevtiye ber êrîşa desthilatdaran û mixabin hatiye kavil kirin. Li serdemê şerê Îran û Îraqê ew bajar bi dehah car hate kavil kirin û bi sedan kes ji xelkê herêmê hatin kuştin.

Kurdên herêmê li dirêjahiya dîrokê û li hemû qonaxên xebata netewî ya gelê Kurd li dijî dagîrkerên Kurdistanê xebat kirine û kesyetiyên wekî Bapîr Axa Mengur, Hemze Axa Mengur û bi sedan kesayetiyên din pêşkêşî tevgera rizgarîxwazî ya Netewa Kurd kirine. Li serdemê serhildana gelên Îranê li sala 1975a zayînî gelê Kurd xwest ku bi mafên xwe yên Mirovî û dîrokî şa be, lê sed heyf û mixabin rejîma Melayan ev yek nepejirandin û her seba vê yekê şerekî malwêranker bi ser Kurdistanê de sepandin. Li encama ew karê rejîma Îranê bi sedan ciwanên welatparêz tevlî serhildana gelê Kurd bi rêberîya PDKÎ bûn û li dijî rejîma Îranê rawestan.

Ciwanên vê herêmê jî li vê serhildana dîrokî pişikdarî kirin û bi sedan ciwanên wî bajarî li rêya demokrasî û mafên netewî yên gelê Kurd canê xwe yê pak goriyê azadî û neteweya xwe kirin.


Li wî bajarî bi sedan Pêşmerge û fermandeyên wek: şehîdan Qadir Êftixarî û Îbrahîm Şêxalî pêşkşî baregeha azadiya gelê xwe kirine.



www.arsivakurd.org

# Di 32'mîn salvegera avabûna RDKÎ de

Hejmar 185, 20'ê Hezîrana 2012



Luqman Mêhfer

Roja 27'ê Cozerdana îsal, Radyo Dengê Kurdistana Îranê pê dawêje nava 32 saliya temenê pir ji şanaziye xwe. 31 sal berî niha RDKÎ bi keresteyên fenî ên herî despêkî û piştewaniya herî kin ya madî, bi sê zimanên Kurdî, Farsî û Azerî li ser pêlên 41 metrî, yekem pirograma xwe ya fermî bi gotara rêberê navdarê kurd Dr.Ebdolrehman Qasimlo, Sekreterê Giştiyê wê demê yê partiyê dest pê kir û programên din bi bêjeriya Mistefa Hicrî, Sekreterê niha yê partiyê wekî yekem bêjerê vê radyoyê weşiyan.

Piştî derbazbûna pitir ji sê dehikan bi ser avakirina vê Radyoyê de, niha baştir derdikewe ku hizr û bîrokeya avakirina vê radyoyê, di rewş û serdemê ji dayîkbûna xwe de, çiqas hizrek pêşkevtîxwaz, zanistî û bi nêrînek eqlanî bûye.

Ku eva jî du mebestên sereke li xwe digire:

Yekem: Bo gehandina dengê mafxwazaneya gelê kurd bi raya giştî, bona bidestxistina mafên netewî û şiroveya siyaset û stratejî û armancên wê bo civatên xelkê kurdistanê.

Duyem: Pûçkirina naveroka siyasetên dijî gelî ên deshilatdarên hakim biser kurdistanê û eşkerekirina pîlan û cînayetên rejîma Komara Îslamî derheq gelê kurd.

Di rewşekê de Dengê Kurdistana Îranê hat avakirin ku sal û nîvek bû rejîma taze bi deshilat gihîştiye Komara Îslamî li seranserê Îranê bi awayek hovane dest dest dabû serkuta azadiyên demokratîk di Îranê de.Kurdistan ketibû ber êrîşan û hatibû dorpêçkirin û roj nebû li bajar û gundên kurdistanê kuştinên bikomî birêve nebe. Leşkirên cehl û nezaniyê di bin siya fitwaya reşe Xumênî de, kuştin û rijandina xwîna xortên kurd bi helal û bi erkek şer'î û yasayiye xwe dizanîn. Hemû hewlên han bona jinavbirina azadiyên demokratîk li Îranê û fetisandina dengê mafxazaneye gelê kurd li kurdistanê bû.

Di rewşek weha bi tirs û xof de, Dengê Kurdistana Îranê, yekem tirîbûna kurdî bû li nav hemû rêxistinên siyasî ên Îranî û Kurdistanî de ku hêviyek mezin xist dilê guhdar û evîndarên dûr û nêzîke xwe. Û mizgîniya xebatek berbilawtir û şûndanertir bi hevwelatiyên têhniyê azadiyê da û momek teyîsand ku heta niha bûye bi meşxela ronahîker a riya xebatê.

Ji hêla din, nasîna taybetmendiyên civaka kurdistanê sedemek din bû bo avakirina radyoyê. Ji ber ku wê demê piraniya xelkê Kurdistan û Îranê nexwendewar yan ji kêm xwendewar bûn, lewma pêlên radyoyê bê arîşe û berbestên zemanî, cuxrafî û siyasî, dikarî herdem li nebûna pêşmerge de, serî ji her mal û cihekê bide û li guhê her kesî/ê de biçipîne. Bi vî awayî bi îmkanatek gelek kêm, Radyo Dengê Kurdistana Îranê derket qada tekoşînê di pêxema azadî, pîşketin û xebat bona bidestveanîna dirûşma stratejîkî a wê demê ku ''demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê'' bû. Ji wê rojê ve heya niha bêrawestan erkê xwe yê pîroz ku gehandina dengê PDK Îranê ye, bi cih aniye. xwezayî ye ku di vê peywendiyê de jî kêmasiyên radyoyê jî hebin, çûnkî bi astengên mezin re berbirû bûye û bi dehan car li ser çiyayên bilind heya deştên pan û berîn ên kurdistanê cihê xwe guhertiye. Wê yekê jî zehmetî û fîdakariyek zaf xwastiye.

Hêvênê wê fîdakariyê jî ji îman û bawera qahîm a kadr û pêşmergên partiyê û piştewaniya xelkê kurdistanê çavkanî girtiye. Herçiqas ku di wan 31 salên temenê xwe de bi kêmî rû daye ku weşanên radyoyê ji ber sedemek teknîkî yan sebebek din bernameyên xwe derengtir ji dema xwe weşandibe yan ji weşanê sekinî be, ku li vê derheqê de xelkê kurdistanê nîgeran bûne.

Lê ew peywendî û hebandina han bi hêsanî çê nebûye. Radyo Dengê Kurdistana Îranê xweştevî ye, çûnkî dengê Partiya Demokrat, partiya pêşeng û şoreşvanê xelkê kurdistanê ye. Dengê zelal yê xelkê kurdistanê ye, bas ji hêvî û armancên xelkê dike û ji bo bidestanîna armancên wan dixebite. Radyo dostek bi pirensîp, rastbêj û niyetpak bûye, guhdarên xwe berxwar nekiriye û rastî, çiqas tal bûn jê neveşartiye. Tenê nûçeyên xweş û bas ji serkevtin û cejn û şahiyen nekiriye, belkî nûçeyên karesat û terora rêberan û şehîd ketina xortên xweştivî, îdama girtiyên siyasî, hovêtiyên rejîmê, jiyana pirr ji êş û çewsandinê di bin siya rejîmên dîktator û kevneparêz de belav kiriye. Lewre jî li beşên din ên kurdistanê de jî guhdarên xwe hebûn û xelkê wan herêman rêz jê digirtin. Nek her dostan, belkî dujminên gelê kurd jî weke çavkaniyek rast û girîng di nava ragehandinan de didîtin. Herçend îro di bin siya pêşketinên teknolojiya serdem û derketina kanalên esmanî, ragehandinên giştî pêşketinên berçav bi xwe dîtine û evê jî bandor li ser karê radioyê kiiriye, lê bi vî halî jî Dengê Kurdistana Îranê guhdarên xwe her hene û girîngiya xwe ji des tedaye.

RDK Îranê bûye stiriya kelema cave dujminên azadiyê û herdem di hewla fetisandina wê de bûne, lê bi xweşî ve hewlên wan hertim şikestxwarî bûne. Dema ku Radyo weşanên xwe dest pê dike, rayedarên rejîmê vediciniqîne û tine bîra wan ku ev radio, zimanhalê partiyek pêşeng û şoreşvan weke PDK Îranê ye, hevdem keniyek pir ji hêvî dixe ser lêwên xelkê kurdistanê. Hekî caran Radyo Dengê Kurdistanê li ser şepêla 41 û paşan jî li ser 60 û 75 metriyê de di bin pêlên parazîta tund ya dûjminê gel û azadiye de, tenê di nava çiyayên kurdistanê û çend deverên Rojhilata Navîn de dihat guhdarîkirin, îro cuda ji wan firêkansan, radioyê malpera xwe haye û li ser kenala esmaniya Tishk tv ku berhemê xwîn û fîdakariya bi hezaran şehîdên kadr û pêşmerge û endamên partiyê ye bilaw dibe û li piraniya welat û dewerên cîhanê de dengê wê tê bihîstin.

Serbarê pîrozkirina vê rojê ji hemû xelkê kurdistanê û evîndarên vê radyoyê, sere rêz û hurmetê li hemberî fîdakarî û cangorîtiya hemû şehîdên serbilind bi taybetî yên ku cîdestê wan li karê radyoyê de heye, ditewînin û rêberên şehîd û hemû şehîdên hizb û gel xatircem dikin û soz didin wan ku heya serketinê her zîndî û berdewam li pêxem xizmetkirin bi armancên gel de dimîne.

## Kaniya helbestan



### MEGRÎ DAYÊ MEGRÎ

*Dayîkê ez qurban em rêwiyên riya dûr in*
*Pêşberê me çiya, newal, banî û kendal in*
*Megrî, dayê megrî ez gorî te û berbextê te*
*Bo xatirê doza me barê me bîne em herin*
*Dayîkê ez qurban em şoreşgerên welat in*
*Em rêwiyên azadiyê, em zarokên gel in*
*Megrî, dayê megrî, te pir kul, xem, jan dîtiye*
*Tu rewşa me dizanî rêdan bide em herin*
*Em rêwîne û rêwiyên, şanaziyê, rûmetiyê*
*Em rabûn ser piyanin û diçin bo azadiyê*
*Megrî, dayê megrî rondikên xwe nebarîne*
*Qet nekeve nav xeman dilê xwe neêşîne*
*Şere şere me mehşere mij e, dûman, agir e*
*Wiş teqîna çekane wax xurmîna gogan e*
*Megrî, dayê megrî heyfa wan her çavan e*
*Serhildan, berxwedan bo mafên gelan e*
*Ax dayîkê ax welatê me çar perçe kirine*
*Nav hevde parvekirine û hemû jî mêtine*
*Megrî, dayê megrî û heval distînin axa me*
*Dayê şoreşger rabûn îro azadiya Kurdane*
*Polîs, leşker tev hatin êrîş anîn li ser me*
*Qir bikeve koma wan, agir xistin canê me*
*Megrî, dayê megrî û ramîsim her destên te*
*Mizgînî hat li me re rizgar dibe welatê me*

*Mehmet Çobanoglu*
*15.02.2010*

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com





Ciwanro, gundê Şerwênê

## Gora Turgut Ozal tê hildan



**Hikûmeta Turkiyê gehiştiye vê encamê ku mirina Turgut Ozal, Serokwezîrê berê yê Turkiyê cihê şik û gumanê ye.**

Di raporê de daxwaz hatiye kirin ku gora navbirî bihê hildan û termê Ozal bi merema lêkolînên pizişkî û eşkerekirina sedema mirinê, here pizîşkê dadweriya Turkiyê.

Ebdula Gul, Serkomarê Turkiyê ferman da koşka Komariyê ku pêdeçûnê bi ser rastî û dirustiya mirina Turgut Ozal de bikin.

Turgut Ozal 8'mîn serokê welatê Turkiyê bû ku di 17ê Nîsana sala 1993'an de bi awayek nediyar canê xwe ji dest da.

## Piştî 21 sala çavnihêriyê, Xelata Nobela aştiyê stand



**Ang Sang Sûçî, rêbera tevgera demokrasîxwaziya Bêrmê (Miyanmar), roja 16ê Hezîranê li Bajarê Uslo ya paytexta Norwejê Xelata Aştiya Nobelê wergirt.**

Xelata han sala 1991'an, ji ber xebata bo azadî û demokrasiyê pêşkêşî Ang Sang Sûçî hatibû kirin, lê ji ber ku wê demê navbirî li hepsa malê de bû nekarî xelata han bistîne.

Navbirî piştî guherîna deshilata leşkirî a welatê Bêrmê bo desthilatek sivîl, sala 2010'an ji hepsa malê derket û serbest hat berdan.

Piştî midehekê jî, weke nûnera parlemêntoyê hat hilbijartin.

## ''Daweta kurdî li dijî Şirîetê Îslamî ye''



**Pêşnimêjê demî yê bajarê Sine ragehand ku dawet û semaya kurdî digel Şirîeta Îslamê nahê.**

Pêka nûçegihaniya Mûkiryan, Mihemed Emîn Rastî di civîna Civata Çandiya parêzgeha Sine de ragehandiye ku di olê Îslamê de tu pênaseyek bo dawetê nehatiye kirin û tomar kirina wê weke mîratê menewî ê Parêzgeha Kurdistanê jî şaşiyek mezin e. Wî da zanîn ku şahî û dîlana ku xelkê kurdistanê di rojên şahî û xweşiyê de dikin, cuda ye digel şirîeta Olê Îslamê.

Wî daxwaza çavdêriya tund bi ser merasîmên şahî û govenda kurdî de kir û ragehand: Pirsgirêka han, tenê bi jiholêrakirina van bone û rê û resman û cudakirina wan ji çand û civaka îslamî de çareser dibe.



www.arsivakurd.org